


ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



NAVEROK

Nameyên Xwendevanan	3
Bingehên Helbestên Cegerxûn	4
Roja Jinan	9
Dr. Michael Hemphrey	10
Helbestên Xwendevanan	12
Listeke Peyvên Sinonim	13
9 Saliya PSKT	16
Du Biranin	20
Eliyê Evdılrehman Kiye	21
Pêşgotîna M.S.Lazeref	24
Qıco	26
Zarok	28
J1 Nav Weşanan	30

SAL : 5
HEJMAR: 47

Xwedi : Komela Karkerên Kurdistan
L1 Swêd

Berpirsiyar : Rohat
Navnişan : Karlbergsv. 32B. nb
113 27 Stockholm

Telefon : 08-328251
Hesap No : PG. 458980-0

Utgivare : Svensk-Kurdiska
Arbetar Föreningen

Ansvarig Utgivare : Rohat
Adress : Karlbergsv. 32B nb
113 27 Stocholm

PG. : 458980-0

JÎ XWENDEVANAN

SOVYET

Min kovara we "ROJA NÛ" hejmara sê wemin stand, gelek şabûm, kêfa min xweş bû, nîvisar û gotarên têda çapbûyi gelek rindin, bî pîrani gotarên "Lî ser navên mehan", "Hevpeyvin Bî Dr.Kemal Fuat va", "Defina Peyvên Zî manê Kurdi", "Biraninek Lî Ser Gora Ahmedê Xanê" û yêd mayin. We dî dane zana xwe da daye kîvşê ku çapxana kôvara "Roja Nû" romana Ereb Şemo "DIMDIM" çap kiriye. Jî bo vi kari pêwîste ez bêjîm eferîm jî qewata we ra, jî xireta we ra, we tîştêki pîr baş kiriye.

Prof. Qanatê Kurdo
Leningrad

ELMANYA

Wek kovareke Roja Nû çawa bî kurdi derdikeve, jî bo pêştabîrîna çandeke netewî, pêşketî û jî bo gulvedana zîmanê nîvisandîne pîr kêri me tê. Heta niha 3 hejmarê wê ketin destê min, bî rasti derketîna vê kovarê baweriyên me xurttir û hêztir dike.

Bî sîlavên Germin
Hasan Dewran
MANNHEİM

ELMANYA

Hevalên Berêz, tekoşerên dîlsoz, Beri pêşin ez sîlavên şoreşgerî û germin jî bo we rê dîkîm û ez hêvi dîkîm weki hûn dî vê xebata xwe ya hunerî, çandî û edebî da pêşkevî û serfîraz bîn. Dîvê em bêjîm, weki we şandîna kovareke min "Roja Nû" jî bo pêşveçûn û parastîna zîman û çanda kurdi, dî rojên îroyî da rolêke hêja û gîranbuha dîlîze. Ew dî jiyîna gelê me da wek şîşêke sorkirî dî dîlê dijîmî dîkeve. Pêwîste her ronakbîr û şoreşgerêki kurdi bî dîl û can hevkarîya kovara "Roja Nû" bike. Dî dawiyê da jî bo "Roja Nû" serkevîtin û jiyanêke dirêj dîxwazîm.

Hevalê we
A.Otmann
Elmanya Federal

HOLLANDA

Jî ber weşandîna kovara "Roja Nû" ez, we pîroz dîkîm û dî karên duwaro jê da jî we ra pêşketîne dîxwazîm. Ez vê helbesta xwe jî pêşkêşî Roja Nû dîkîm.

USO
Hollanda

BULGARYA

Hevalên hêja, berpîrsiyarên kovara Roja Nû !

Em gelek sîlavên şoreşgerî jî bo we pêşkêş dîkîm, hertîm serfîrazi û pêşveçûna we dîxwazîm.

Em gelek kêfxweş dîbîn jî bo xebata we, ev xebata lî ser çand, huner û edebiyatê kareki pîr hêjaye.

Bî rasti kovara "Roja Nû" cihekî pîr gîrîng dî nav gelê kurdi da û bî


taybetî dî nav rewşenbîrên wî da dîgre. Jî bo vê yekê ne dûre, weki çapa "Roja Nû" hîn jî zêde bike.

Sal bî sal hejmara xwendevanên kurdi lî Bulgariyê pîr dîbîn. Jî ber vê yekê, em dîxwazîm hûn kovarên ku jî me ra dîşînin, hejmara wan zêde bikin.

Bî sîlavên şoreşgerî
Xwendekarên Kurdi lî Bulgariyê

Bingehên Helbestên CEGERXÛN

GUNDI



PIROZ BE 80 SALIYA.....

Banga jiyan
Kaniya evin
Ala azadi
Bernama serketin
Mirovê mirov
Aştixazê cihan
Lawê Kurdistan
Rêzanê Kurdistan
Piroz be 80 saliya Cegerxûn

Wê çiqas başba, eger 80 saliya Cegerxûn lî her derê, lî welat û
lî dervay welat, bî cejn û şahiyên mezîn va bîhata pirozkirin. Wê
çiqas hêjabiya eger dî wan cejn û şahiyên da bî hezaran xort û
keçên Kurdistanê bîghîştina hev, bîciviyana û bî xwendina helbes
tên Cegerxûn hên baştir bînasina rêça Cegerxûn. Lê mîxabîn, sed
carî mîxabîn...

Bîndestiya gelê me
Perçebûna me
Nezaniya me bûne barên giran
Nahêlîn em pêşva bîçîn, em şa bîbîn
Nahêlîn em cejnên xwe bîkîn cejn
Newrozên xwe bîkîn newroz
Cegerxûnê xwe piroz kîn
Nahêlîn em bîbîn yek... bîserkevin.

Lê tevî nezanîyê, perçebûnê, bîndestîyê, tevî barên giran pêwis te em bê deng nemîn, cejnên xwe bê pîrozkirin nehêlin û doza xwe bi dest neyaran da bernedîn û welat nehêlin meydana biyanîyan.

Careke din mexabîn, ku gelek armancên Cegerxûn heta niha li Kurdistanê pêknehatine. Lê tevî vê jî Cegerxûn hertim bi bêhna fireh bi sebîr, bi dîtineke dûr û bi hêviyeke mezîn û xaşbini xebatkirî ye û hên ji dîxebite.

Cegerxûn jî bo me, bo keç û xortên me, bo newiyên me rastirîn waneye, baştirin mamosteye.

Cegerxûn ne tenê helbestvan û niviskare. Cegerxûn miroveki rast mirove, bawermende, diltenike, evîndare...

Cegerxûn kaniyeke jî kaniyên ziman û çanda kurdi. Jiyana Cegerxûn bixwe diroka welat û netewa meye di sedsalê bistan da.

Cegerxûn lawê gelê bîndest, lawê çina bîndeste....

Cegerxûn tevî dijminahiya gelek dijminên çinayeti, oli û netewî û tevî hejarti û belengaziyê bû mamostê çina xwe, bû rêzanê gelê xwe.

Helbestên Cegerxûn jî zû da bûne sirûdên azadiyê ketane nav xûn û giyanê gelê me. Ew bûne bernama serketina şoreşa netewî û civakî di destên gelê me da. Lewra pêwîste em bernama serketina xwe baş bixûn, baş nasbikin.

Xwendevanên delal werin em bêhnekê li siya Cegerxûn rawestin, guhdarkin li gotin û şîretan !

Pîrsên bîngehin di helbestên Cegerxûn da

Heya niha heft diwanên Cegerxûn hatine çapkîrîn û belavkirîn. Di wana hefta "Hêvi" teze çapbûye û hên neketiye destê min. Sala 1948 Cegerxûn çiroka "Cim û Gulperi" û sala 1956 çiroka "Reşoyê Darê" daye çapê. Sala 1973 çiroka helbesti "Salar û Midya" hate çapkîrîn û belavkirîn. Di warê zîmanê kurdi da jî Cegerxûn jî zû da karkirîye. Sala 1962 da perçe jî ferhengeke kurdi daye çapê.

Hêviya me ewe ku mamostê mezîn hên nivisarên çapnebûne zû bide çapê, da ku têkevin destên me û bîbin milkê gel, weke çawa hemû nivisarên çapbûne iro mal û milkê gelê mene.

Di van diwan û pirtûkan da mamostê mezîn li ser gelek pîrsên jî yana mirov, jiyana civakî, doz û bûyerên netewî û navnetewî sekîniye. Her wusan Cegerxûn bi zelali ramanên xwe yê felsefî jî nivisandine û li gor wan bir û bawerîya xwe li ser ol û rola wî ya civakî bê perwe û bê tîrs gotiye.

Ciheki girîng di van nivisaran da mamoste daye evin û dildariyê

Tîşteki zor dijware ku mirov kanibe van pîrs û dozan jî hev cudabike. Hemû bi hev ra girêdayine. Lê bo nivisandinê mirov neçardibe çend xalan daye û çend sinoran diyar bike.

1. CEGERXÛN Û DOZA NETEWÎ

Cegerxûn li welateki dagîrkirî, li nav geleki bîndest hate dunyayê. Hên di derguşa xwe da, bi şîrê dayik ra zulm û zordari nas-kir, Cegerxûn çavên xwe vekirîn li şûna ala Kurdistanê ala kole-daran dit, li şûna leşkerê niştîmanî, sungiyên dijminan ditin, li şûna doktor û mamostê welêt leşker û cendirmên biyanî ditin...

Lewra welat û welatparêzî bûn hestiyê piştî hemû nivisarên Cegerxûn. Ew li Kurdistanê xwe geriya û bangkir.

Cegerxûn bi raperinên gelê xwe pîr şabûye û zaniye, ku ewê rojekê bigihên armancên xwe. Lê di vê rê da her mistek jî qada Kurdistanê bi xûna keç û xortan, zarokan, dayikan, mêr û jinan hatiye avdan, li ber her zinareki nalinek hatiye çandin, hêviyek hatiye kuştin.

B1 her şikandinekê ra dilê Cegerxûn şewitiye, hêstirên wi herikine. Cegerxûn jiyana û mirna xwe b1 mayin û nemana welatê xwe va ditiye.

Îro b1 dilşadi mirov dikare bêje ku gelek welatparêz nexaşiya gelê xwe dinasin û zanin ku ne yekitiya me sebebeki bingehiye j1 berdewamkirna bîndestiya me ra.

Diroka kurdi j1 aliyeki va hatiye ristin j1 mêrani û qehremaniyê, lê j1 aliyê din va hatiye ristin j1 perçebûnê, j1 birakujiyê j1 baweriyê b1 dijmin, j1 nezani û bêhişiyê...

Cegerxûn zû ev yeka d1 nav kurdan da dit û tu kesi weke Cegerxûn ev pîrsa wusan hêja j1 hevnekiriye.

B1 rasti eve nexaşiya me, ku niha b1 me dijware em b1civîn,guh-dari hevkin, rîsta xwe çêkin û b1bîn yek.

Lewra d1 gelek helbesten da Cegerxûn xwe banga xwe bilindkiriye bo rabûnên tevayi b1 hev ra.

L1 ser doza welat Cegerxûn gelek tîşt nivisiye, lê b1 kurti em dikarin bêjin, ku Cegerxûn d1 welatê xwe da jiye, birinên welatê xwe dine û l1 dermanê birinan geriyaye rêya serketinê, rêya serwebûnê pêşkeşkiriye.

2. CEGERXÛN Û DOZA ÇINAYETI

Bêgumane, ku her mirovek, l1 gor salên jiyana xwe l1 gor rewş û zanina xwe d1 pîr bergehane ra derbasdibe. Her wusan Cegerxûn j1 çend bergeh derbaskirinê.

D1 nivisarên pêşin da Cegerxûn hên bigermi netewperest bû, xwe tenê kurd dizani û deng l1 netewa kurd b1 tevayi dikir. Çend helbestên destpêki d1 b1n bandora romantikiyê da hatine nivisandin.

Lê hêdî hêdî Cegerxûn dijayetiyan civaki û çinayeti roşentir dît. Jê ra eşkerebû, ku doza çina jor û doza çina jêr ne yek tîştin. Gumanên Cegerxûn mezindibûn, lê hên b1 تمامی hêvi j1 begler û paşan û axan nebiri bû.

Lê Cegerxûn d1 xebate rojane da dit, ku ew begler û axan dijminên azadiya gelin û heval û dostên dijminin. Ew keda destên karker û cotkaran b1 darê zorê dikin mîlkê xwe û dixun. Êdî baweriyaya Cegerxûn nema b1 wan dihat û hêvi j1 çina jor biri û b1 dengeki bilind bangkir karkeran, zehmetkêşan.

3. CEGERXÛN Û DOZÊN CIVAKI

Cegerxûn d1 helbestên xwe da û her weha d1 xebata civaki û siyasi da dest avêtiye hemû pîrs û dozên civaki. Wi derd naskirine û derman ditine. Pêwîste helbestên Cegerxûn b1 tevayi bêne xwendin, j1 ber ku ew dewsa bernama şoreşeke civaki nişandidin.

a- Pîrsa xwendin û zaninê

Cegerxûn dema xwe naskir, ku ew dema pêşketina zanistiye, lewra d1 her derê da gotiye bixûnîn, zanabîn, hişyarbîn, herne pêş, welatê xwe j1 destên dijminan derxin.

Her dişa Cegerxûn ditina xwe l1 ser xwendinê ducarkiriye

b- Pîrsa ol û olperestan

Cegerxûn d1 xwendegehên oli da xwend û d1 zanista oli da pîr pêşket. Ew l1 nav Kurdistanê geriya û l1 her derê rasti komên hejar û perişanan hat. Cegerxûn l1 rêya serbestiya gelê xwe geriya. Wi dit ku axa û beg keda zehmetkêşan b1 zorê j1 wan dibîn, şêx û mele j1 hişên wan b1 fort û listik û derewan j1 serê wan dibîn.

Cegerxûn jî zehmetkêşan xwast xwe jî koletiya axan, şêx û melan rızgar bıkın, serê xwe hıldın lı dıji herdû dijminan. Û weke çawa ew hêdi-hêdi kete şerê mayin û nemanê bı axan û began ra wusan jî wi şêx û mele kırın kêla nişanê û heta iro jî berê tıvinga xwe jî ser wan nedaye ali. Cegerxûn yek derewa wana veşarti nehiştiye.

Cegerxûn bı carekê baweriya oli berda û bû xudanê felsefa meter yali (maddi). Wi bı ideyolojiya oli bawer nedikir, lê wi rol û bandurên ol yên ramani û cıvaki inkar nekırın. Cegerxûn her berxwedaye melan jî bine ser rêya xebata welat û rızgariya gel. Ev gava gelek rast dı xebate niştımanî da, ku pêwiste mirov sûdê jî hemû hezên cıvaki bıstine. Cegerxûn xastiye melan jî xewê rake, da ku lı dora xwe temaşekır, çı lı cihanê çêdibe.

c- Pırsa rızgariya jinan

Hiç tu caran Cegerxûn dı helbestên xwe da cudabûn nexıstiye nav bera jin û mêran. Jin dı helbestên Cegerxûn da hertım dayika şırî ne, xûşka delale, jına dılsoze, hevala tekoşere û dosta dıldare. Bı van dıtınên mirovani Cegerxûn lı jinan temaşekiriye, jî wan xastiye, ku piyên xwe bavêjin, têkevın nav rêzên tekoşeran, kar bı kın, bıxûnın, hışyarbın û lı şûn da nemının.

Bı vî awayi Cegerxûn dı nav kurdan da serpêşi bo rızgariya jinan kışand û bı rastı dema mirov helbestên Cegerxûn lı ser jinan dıxûne û guhdariya wi, dıke, mirov dıbine, ku Cegerxûn hertım dı pêşiya zemanê xwe da bû û heya iro dı 80 saliya xwe da jî lı pey zemên nemaye.

4. CEGERXÛN Û DOZA NAVNETEWÎ

Jı demeke zû da Cegerxûn doza kurdiya netewi bı ya navnetewi va gırêdayi ditiye. Wi bê hejmar bang kırıye bo bıratıya gelan, bo pıştgırı û hevkarıyê dı şerê dij kolonyalisti da û lı dıji êriş û peymanên impêryalistan. Bı sedan car Cegerxûn gotına aştıyê dı helbestên xwe da bıcihkırıye. Her wusan jî bê rawestan sıyaseta nijadperesti şermezar kırıye. Cegerxûn jiyana xaş bo mirovayetiye gıştı dı şıkandına nirê kolonyalist û imperyalisti da, dı hevjiya na wekhev da, dı aştıti û pêşketınê da, dı hılanına sinoran da dıbine.

Cegerxûn lı dıji êrişên koledaran lı her derê rawestiye û pıştgırıya hemû gelên bındest û tevgerên azadixaz kırıye.

Em şer naxwazın bımrın şer û ceng

Me natırsênın ev qêrin û deng

Eger dıxwazın zılma alemi

Jı axa (Karê) derkevın hemi

Em tev heval û bırane, insan

Ji me çı divê mister Tıroman

Lı aliyê dın, lı hemberi koledaran Cegerxûn Yekıtiya Sovyête û rısta sosyalist doşt û hevalên gelên bındest naskırıye û pır caran dı helbestên xwe da ev doza eşkere kırıye.

5. CEGERXÛN Û EVİN

Eger helbestvanek ne evındar be, ne dıldar be, eger ne bı çavên evinê tıştan bınese lê temaşeke, eger jı kûraniya dılê xwe da jı dozên helbestên xwe hez neke, ew ne helbestvane.

Ne her niviskarek helbestvane û ne her miroveki xweda û zana dıkare bıbe helbestvan.

Helbestvani bı xwendına pır û bılınd dewlemend dıbe, lê ew ne tenê encama xwendınêye. Helbestvani dı xûna helbestvan daye. Wusan

Cegerxûn b1 dîlovani, b1 dîlgermi bersîva pîrsên jîyan û evinê dane. D1 helbestên evinê da ji Cegerxûn, heya niha û weke em zanin, siwarekî bê hempaye.

D1 "Şeva Qedrê" da Cegerxûn bendewarê dilberê bû, çavên xwe l1 bejin û siya wê bû :

*Şeva qedrê l1 mîn rewşen dîkîr şewq û şemala keç,
L1 mîn xani dibû gulşen b1 wê hîsn û cemala keç. 3/196*

Her weke "Gulfiroşê" helbesta "AGIRÊ EVÎNDARÎ" bûye hîstîr û l1 Kurdîstanê belavbûye :

*Şev tev çûye idi ma tû hew tê lo
Ez ranazim, kengi bê tem xew tê lo
Xani bûye zîndan tê de ranazim
Ta sîpidê qir û nal û tew tê lo
Tevi pêt û şewata dîl, tevi bendewari û çavnêriyê,
tevi şevên bê xew.....*

Cegerxûn d1 evinê da ji her tîm b1 hêviye, xaşbine, dîlşade :

*Pîr xweşe pîr xweşe
Ev dînya pîr xweşe
Yar pal daye ser mîn
Rû wek gula geşe*

*Em saza hebûnê
Doza peydabûnê
Dengê saza rîndî
Rewşa serbîlîndî (4/131)*

L1 bal Cegerxûn evin ne gunehkariye, mîrovaniye, dengê jîyane, hêjaye, pîroze...

6. CEGERXÛN Û DÎWAROJ

Cegerxûn d1 gelek helbestan da hêviyên xwe bo diwaroj û bo armancên tekoşîna xwe eşkere gotine.

D1 "Salar û Midya" da Cegerxûn ketiye şaşbûneke ramani. Bavê Midya b1 razibûna xwe serdariya welêt û text û taca xwe dîde Salar. Cegerxûn ev şaşbûna d1 pêşgotinê da serraskîriye. Eger em dest j1 vê şaşbûnê berdîn, ev çirokeke zor hêjaye û zor hêja hatiye nivîsandin. D1 rûpelên dawî da Cegerxûn armancên xwe yê tekoşînê û hêviyên xwe ducar dîke.

8'ê Adarê

ROJA JINAN

Sal 1908, 8'ê Adarê, cara pêşin jinên karker, li New-York ê, di industriya tekstil da jî bo mafên xwe yê abori û jî bo ku karê rojî bête kêmkirin, bibe 10 seet grev danin. Jinên karker gelek zordesti ditin, lê jî tekoşina xwe paşt a venekîşyan. Ev berxwedana wan, wek bûyereke diroki derbasi diroka tekoşina rîzgariya jînan û tevgera çini bû.

Du salan piştî vê bûyere, di sala 1910'an da, 8 ê Adarê, di pêşengiya şoreşgera elman Clara Zetkin da, li Kopenhagê di civinekê da wek roja jinan hate elankirin.

Çawa tê zanin, di sazûmana sermaye dar da "azadiya jinê" gelek caran di rojevê da cih digre, behsa vê pîrsê pîr tê kirin. Lê bî ditîneke çewt û bî naverokeke pûç va. Di vê pîrsê da jî, bûrjûwazi kirasan dikşine ser rûyê rastiye. Tevgera jinan bêtir di mêla feminist da tê nişandan û jî bîngêhên çini tê dîrxistin. Pîrs wek pîrseke cînsî û serbixwe tê pêşkêşkirin. Jin wek cîns, çineke serbixwe pêk naynin. Daxwaz merem û di jwariya her jinê wek hev nine. Jineke jî çina burjuva bî jineke jî çina karker va nabin yek, daxwaz û di jwariyên wan wek hev nabin.


Di welateki kolonî wek welatê me Kurdistanê da, zordesti û di jwariyên li ser jinê qatek zêdeye. Jî tunebûn û xezaniyê, jî nezaniyê, jî dan û standinên feodali û jî zordestiya kolonyalist, jinên me pîr dikşinin. Jî jinên Kurdistanê, tenê jî sedî 12/13 dikarin bixwinin û binvisin. Ev birineke kûre, xirabike mezîne ku kolonyalîstan bî gelê Kurd ra kirîne. Ew, baş pê agahdarin wek jinên zehmetkêş yê Kurdistanê wê rojekê, bî sedemê belengaziyê hayidar bin, bîkê vine nav tekoşinê û wan jî welatê xwe paqîş bîkî bavêjên der.

Jî berê da jinên Kurdistanê tevi şerê azadiyê bûne û iro jî dibin. Lê



mîxabin hê iro jî, rêxistin û rêzbûneke xurt, ku dengê wan di warê netewî û navnetewî da bilind bike, pêk nehatiye. Ev, jî bo rîzgariya netewî û civaki kêmasike mezîne. Di vê babetê da wezîfeyên di jwariya jî jinên şiyar û zane ra dikeve. Em jî dil bawer dikin ku jinên Kurdistanê wê vê wezîfê, zû dereng binin cih. Jî bo Kurdistanê azad û demokratik hêza jinan wê roleke mezîn bileyze.

Dr. Michael Humphrey :



"KURDÊN LI DERVAYÎ WELAT, DIVÊ JI BO
PÊŞDABIRINA ÇANDA XWE, XEBATEKE JÊHATÎ
BIKIN, DERS Î KULÊN XWE, NEHEQÎYA LI WAN
DIBE, BI GELÊN ROJAVAYÊ BIDIN NASKIRIN."

Heval Şahîne Serokli li Australyê bi Dr. Michael Humphrey va hev peyvinek li ser hin pirsên çand-ziman û li ser rewşa Kurdan amade kiriye û jî bo çapkirinê jî Roja Nû ra şandiye. Em li jêr vê hevpeyvinê pêşkêşî xwendevanên xwe dikin. Dr. Michael Humphrey di beşa "Anthropology And Comparative Sociology" (Zanibûna li ser Mirovan û Peywendiyên Cîvaki) da pêşexzan û pisporêke. Li ser gelên Rohilata Navin gelek xebatên wî jî hene. Ew bi xwe li bajarê SYDNEY, di zaningeha bi navê MACQUARIE da dixebite.

PIRS: Rola ziman di hebûna geleki û pêştaçûyina neteweki da çiyê?

BERSÎV: Ziman roleke zor mezin di xwenasiya neteweki da dilize. Ew toximê çanda gelekiye, ew hêzeke xurte ku endamên gel nêziki hev dike û wan di hundur neteweki da dike yek. Siyonistan ev yeka pîr baş zanibûn, bo vê yekê sazkirina Îsrayilê kirin pratikê. Di sala 1932'an da siyonistan zimanê Ebri jî bo hemû Cihudan (Yahudi) kirin zimaneki resmî. Paşê cihudên li Ewrûpê li dora ziman û çanda Ebri cîvandî û ew bûn yek. Zimanê Ebri zimaneki kevînbû, he ma li mirinê bû, paşê ew kirin zimaneki nûjen û pêşketî. Di sazkirin û pêştabirina netewan da giranbûna rola zimanan pîr mezîne. Jî bo hukmetekê di warê politik da ziman tiştêki pîr tenik û nazik tê hesibandîn. Li pîr welatên ku têda gelek ziman tînin peyivandin, carina hin ziman hebûn û tesira xwe li ser zimanên mayin ferz dike û heta dest jî van hêzan tê, van zimanên mayin paştê dihêlin. Siyasetek wusan bi taybetî li welatên kevneperest da cih digre.

Mîrov dikare bêje ku pêşverû û paşverûbûna hukmetekê li welateki da bi siyaseta wî welati ya li ser ziman û çanda wî welati va girêdayîye, ango di wî welati da pîr gel bijîn. Li welatên wek Australya, Emerike Yekbûyî û Kanadayê da, yê ku gelên wan jî mihacîran peyda bûne, di nav salên bihuri da bûyereke nû pêkhatiyê, ew jî di van welatan da pîr çandên cuda li ser hev tesir dikin, wek "Pîraniya Çandan" (Multiculturalizm). Di van welatan da mafên komên etnik, mafên ziman û çandê di bin siya çanda Englo-Seksoni da, di bin tesira zimanê inglîzî da tê hesibandîn. Li van her sê welatan jî rola mezin zimanê inglîzî dilize, tenê li Kanada zimanê frensi zimanê duwemîne. Yek jî, li Yugoslavyê jî bo hemû gelên mayin, mafên çandî hene.

Li hin welatên cihanê çand û zimanên gelan ketine bin zordari û giraniyeke mezin. Li welatê wek Srilanka, berî çendeki çawa me bi hist, pîr xwîn tê rijandin, çimki hukmeta wî welati mawên gelê Tamil, mafên çandî û zimani inkar dike. Li Tirkîyê, di warê çand û ziman da zordestîke bêhempa li ser gelê kurd dajo. Li cihanê wek vê qedexekirinê, misalên qedexeyê tunin.

PIRS: Mafên hukmetan heye ku van zimanan qedexe bike?

BERSÎV: Heta mîrov rewşa navnetewî, zakonên navnetewî neyne holê, nede ber çavan, mîrov nikare bersîvekê bide. Dema zimanek bê

qedexekırın, ev yeka diji mafên mirovane. Lê pır mixabın heta iro ji lı cihanê zıman û çanda hın gelan qedexeye. Lı pır cihan asimi lekırın bı zordari dajo. Mırov dıkare hukmetên wusan rexne bıke û siyaseta wan ya "diji mafê mirovan," lı ber çavên gelên cihanê eşkere bıke. Lê ev yeka ji, zordestan ji riya wan eware nake.

PIRS: Mırovên Ewrûpi, bı taybeti mırovên Inglıstanê, ji sala 1788'an vır da Australya ji xwera kırıne war. Ji vê demê heta iro zımanên gelê Aborigini qet tu caran ji aliyê hukmete da hatiye qedexekırın?

BERSİV: Ez bawer nakım ku zımanên Aboriginiyan tu caran hatıbın qedexekırın. Mırovên Ewrûpi û yên Aborigini tu caran lı tevhev ne jin, ji ber ku wekhevi lı holê tune bû. Kolonyalistan ingliz erdê reşikan ji dest wan girtın û ji wana pır kes ji kuştın. Mırovên Ewrûpi dıgotın (hın ji dıbêjin) ger reşık dıxwazın nêziki me bıjin bıla ew berê xwe fêri metodên jiyana me bıkın, ango asimile bıbın Dı sala 1970'an şun da hın kursên zımanên Aborigini êdi dı hın zanıngêhên Australya da hatın ditın.

PIRS: Hukmeta Federal û hukmeta wilayetan niha lı Australya pişta hınkırın û pêşvabırına zıman û çandên komên etnik dıgrın. Gelo tışteki wusan iro lı Australya ji pêwıste?

BERSİV: Tu welat lı cihanê ji hêla coxrafik da wek Australya tune. Tev ku çand û politika Avustralyê wek yên ewrûpêne, welatên cınarên Australyê gelên Asiya rohilat û nêzıkın. Mırov bıxwazew nexwaze ev welat êdi hêdi-hêdi dıguhure. Çımki nêziki nivê gelê Australya iro ne ji eslê Anglo-Saksone. Hın kes dıbêjin weki iro lı Australyê wek 130 zıman tên peyvandın. Mırov nıkare êdi mafên wan komên etnik inkar bıke, ne bı awaki siyasi, ne ji bı awaki cıvaki. Ev ji meslehetaya wane, dıxwazın Austarlya bıbe welateki pır çandi, ji ber ku ev çandana iro dıghên hev, hev dewlemend dıkın û duwarojê da çandeki rengin wê lı Australyê da pêk bê.

PIRS: Zımanê 20 milyon Kurd lı hın beşên Kurdıstanê heta iro ji qedexeye. Tu lı ser dırxıstına zarokên Kurdıstanê ji zıman û çanda bapirên wan, çı dıbêji?

BERSİV: Ev, bı rasti rewşeke zor-zor xırabe. Hukmeta Tırkiyê iro bı siyaseta xwe ya diji gelên ne bı tırk va lı cihanê deng daye. Hukmeta tırk heta iro ji dı şerê cihanêyi yekemin da qırkırina bı deh hezaran Ermeni hılne da ser zarên xwe. Zor mixabın hın hukmet dıkarın iro ji hın ecêb û bıyeran bıbın serê van gelan. Tırkiye wek welateki leşkeri, wek endameke NATO û wek welateki ku beşek stratejik ji Kurdıstanê kırıye bı destên xwe, dıkare siyaseta xwe ya şoveni lı diji kurdan bıde ajotın. Ji ber ku hebûna hukmeta Tırkiyê, bı meslehetaya Emerika Yekbûyi û ji bo welatên NATO gırıng, çawa ku hebûna İsrayıl lı Rohılata Navin ji bo Emerika Yekbûyi bıye star.

Ez dızanım ku hejmaraya kurdan lı bajarê Sydney ne mezine, lê belam ew xebateke zor jir bona pêşvabırın û danasına çanda xwe tının cih. Grubeke wan folklori bı nav û deng heye û heta bernameye ke wan ya radyo ji bı zımanê kurdî heye. Bı bır û baweriya mın, ev kurdên ku lı derwayi welat dıjin dıkarın roleke zor gırıng dı warê pêştavırına zıman û çanda gelê xwe da bılızın, ji ber ku lı Australya û welatên Ewrûpayê serbestiya peyvandınê heye û kes nıkare zıman û çanda keseki dın qedexe bıke. Kurdên lı derwayi welat dıvê fersendeke wusan ji destên xwe bernedın û wunda nekın. Dıvê ew ji bo pêştavırına çanda xwe xebateke jêhati bıkın, dıvê ew çanda xwe, derd û kulên xwe, neheqiya lı wan dıbe bı gelên Rojava yê bê westan bıdın naskırın.

HELBESTÊN XWENDEVANAN

PARTIYA MIN

Ronakê da
deşt û çiyayên Kurdistanê
dilê min da gul veda
per-baskê min
partiya min.
kor bûm bî çav
ker bûm bî guh
şil bûm bî ling û mîl
da min
partiya min.
ez endam, parti hêlin
hilda bîgehê xwe
jî Marks û Lenin
pêşiya gel vekir
çek da dest
çekeke giranbûha
şerkir bî wê çekê
gelê me bî egiti
ne bî lez
gav bî gav pêşket
ew armanc
belav bû
ci-war bû
lî her alî welat
ramanên partiya min
dizê
jî çavkaniya sosyalizmê
lema kar û barê min da
Kurdistan
dî Kurdistanê da
sosyalizm heye
partiya min.
tu
şevên Kurdistanê
sîniya zivî lî ezman
kureyê Zerdûştî lî erdê
dîçirûsî
nav roj û şevan
nayê fikrandinê
bê te jiyin
mina hewa, av û nani
jî vê şûnda
şaşî-gêjî bû çirok
dest vala te ne hişt
ne min
ne jî
xebatkarên Kurdistanê
her bîjî partiya min
her bîjî !

1980 VAZGAL

LI XETÊ, SÎNORÊN MIRINÊ TUNIN

Dî nav zeviyên gênim da
Em dirêşîn gênim
Dî zeviyêyên gênim da
Em dîçîn gênim
Dî nav zeviyên gênim da
Em dirêşîn gênim
Em dîçîn
Lê, ew dixwî !

zeviyên barutê ew radixî
Radixî ew zeviyên barutê
Dî zeviyên barutê da
Ew radixî barutê
Ew radixî
Lê, em dîmrî !

HASAN DEWRAN

EY WELAT

Dibêjîne min, jiyîna te vemirîye
Çiçek, gul û sosîn êdî şîna nabîna
lî herema rojhîlatê
û.....
Dîdomînî, dibêjî
Çiyayê Sipanê Xelatê reş girêdaye
Gola Wanê mîçîqîye
Deştê Haranê bê av maye
Ava Dîclê û Feratê
Jî xwîna Şehîdên me
Reng sor bûne
Keriyê gakovî û xezalan
Hemû qîr bûne
Leme-lema kanîsarkar
Lîle-lîla keç û xortan ker bûne
Wekî dibêjî
Lî çiyayê Qereşdaxê
Refê rêwîyan danîne
Lî wan deran nehiştîne
Ne keriyê miyan
Ne konê Bêrtîyan
Ne jî listîk û şabûna zarokan
Tenê dibêjî
Dengê topan
Nalîna zarokan
Giriyê dayîkan
û hovîtîya segan maye.

FEXRÎ

ELMANYA FEDERAL

LİSTEKE PEYVÊN SİNONİM

ROHAT

Îro dî zîmanê kurdi da bî hezaran peyv hene, cihê hev dîgrîn, me best û babeta wan yeke. mirov dikare wan lî cihê hev bî kar binê. Ev peyvên wekhev (sinonim) dî zîmanê kurdi da pîrîn. Lê heta niha tu ferhengeke peyvên sinonim dî zîmanê kurdi da nehatiye amadekîrîn.

Jî ber zêdebûna devok û zaravên kurdi, dewlemendi û hêjabûna zar gotina kurdi hejmara peyvên sinonim zêdetir kiriye. Lî herem, hêl û wargên Kurdîstanê iro çawa em lê dînhêrîn pîr peyvên cure-cure tîn dengkîrîn û ew cihê hev dîgrîn. Ev zêdebûna peyvên sinonim bî ditîna me, riya yekîtiya zîmin nabîre, lê serda jî pêşveçûna zîmin leztir dike.

Dema em lê dînhêrîn, cihê xebata her peyveke sinonim bî hev nagrîn, navbera wan peyvên wekhev da cudatîyên tenik hene, kêmhîndîk ew piçekê jî hev dîr ketîne. Lê hemû ev yekena reng û mebesta wekhevbûna wan jî ortê ranake, ew nêzîkî hevîn, jî ber vê yekê jî em jî wan peyvên ra dibêjin gotînen wekhev.

Me lî jêr 100 peyvên sinonim lî pey hev angori sistema alfabê rêzkîrîn û lî hemberî wan jî tîrkîya wan nivîsî. Ev tenê despêk û gaveke. Jî bo xwendevanên me vê gavê û despêkê hîn jî pêşta bîbîn me rê da ber wana. Jî bo berevkîrîna peyvên cuda-cuda xwendevanên me dikarîn hîn jî serê xwe bîêşînin, jî bo berevkîrîna çand û jî bo vekolîna bîngêhên zîmanê kurdi, berbîrsîyariyên nûh hîldîn lî ser mîlên xwe, heta ku ferhenga sinonîman bî zîmanê kurdi hat amadekîrîn.

1. Abûr, deb, malhebûn.	<i>Ekonomî</i>
2. Ali, tang, hindav, pi	<i>Yön</i>
3. Alikari, komekdari, yarmeti.....	<i>Katkî</i>
4. Aşiti, bêdengi, arami	<i>Sukunet</i>
5. Avjeni, sobayi, melevani	<i>Yüzme</i>
6. Axaftin, peyvin, dengkîrîn, xebirdan	<i>Konuşma (k)</i>
7. Azadi, serbesti, filitin	<i>Özgürlük</i>
8. Bal, cem, tenişt, hind, nîk, rex	<i>Yan (ında)</i>
9. Balûl, berbang, berbeyani	<i>Şafak</i>
10. Behredar, kêrhati, bî sud	<i>Yararlı</i>
11. Belengazi, xîzani, tunebûn, desdtengi	<i>Yokluk</i>
12. Berd, kevir,	<i>Taş</i>
13. Berduş, peşmurde, serseri	<i>Salak</i>
14. Bêtir, zêtir, zahftir	<i>Daha çok</i>
15. Bêrûmet, sosret, kîrêt, sekêsîz	<i>Onursuz</i>
16. Bînyat, bînax, bîngêh, him, rîkîn	<i>Temel</i>
17. Bîrîn, baskokîrîn, kurt kîrîn, kurtîsandîn ..	<i>Kırpmak</i>
18. Bîstan, çîcîk, memîk	<i>Göğüs</i>
19. Bîyani, bêgane, dereke	<i>Yabancı</i>
20. Bîzûtîn, tevger, hejandîn	<i>Hareket</i>
21. Çavnebarî, dexes, kumreş, çavteng	<i>Kıskanç</i>
22. Çewsandîn, zêrandîn, kedxwarîn	<i>Sömürmek</i>
23. Deranîn, beranîn, hîlbîrîn	<i>Üretim</i>
24. Derya, dengîz, behr	<i>Deniz</i>

25. Dews, cih, şun, war	Yer
26. Destanin, serfırazi, serfınyazi, pêşketın ...	Başarı
27. Dê, dayik, inê, yadê, lelê, etê	Anne
28. Ducarkırın, dubare, wekılандın	Tekrar (lama,
29. Erd, xweli, ax, zemin	Toprak
30. Erzani, kêmkırın, daxıstın	Ucuzluk
31. Felat, rızgari, xelasi	Kurtuluş
32. Fıravûn, taştê, xweri	Kahvaltı
33. Helperin, dilan, govend	Dans
34. Henek, laqırdi, pêkeni	Güldürü
35. Hertım, herwext, timê, hergav	Sürekli
36. Herem, warge, hêl, parwelat	Yöre
37. Hêja, gıranbiha, berketi, delal,	Değerli
38. Hoj, merc qewl	Şart
39. Hurpızı, tıji, hurberda, qelew	Şişman
40. Gevez, sor	Kırmızı
41. Gır, gewre, mezin	Büyük
42. Guhdari, baldari, çavkutan	İlgi
43. Komkırın, cıvandın, berevkırın	Toplama
44. Kutasi, dawı, paşi, encam	Sonuç
45. Kuvi, hov, beyani	Vahşi
46. Lec, lecbezi, hucet	Yarış
47. Leylan, kılam, stran, dılok	Türkü
48. Lêgerin, izgerin, lêkolin	Araştırma
49. Malxwe, maldar, xudan, xwedi	Sahip
50. Mamoste, dersdar, hinkar, seyda	Eğitimci
51. Meri, mirov, meriv, piyaw	İnsan
52. Mêjva, zûva, berêda	Önceden
53. Mıdas, kinc, çek	Elbise
54. Nav, niv, navçe, navık	Merkez
55. Naveras, navin, navendi, nivçe	Orta (nca)
56. Naverok, têdayi, serecem	İçerik
57. Nebez, tekoşer, mêrxas, bawermend	Yiğit
58. Nefêr, kes, peya	Kişi
59. Nexweşi, êş, jan	Hastalık
60. Neq, car, dolım	Kez
61. Paşwexti, duwaroj, paşeroj	Gelecek
62. Pawandın, parastın, xweyıkırın	Koruma
63. Pevçûn, hevnekırın, berızın	Anlaşmazlık
64. Peywendi, pevgırêdan, danstan	İlişki
65. Pıçek, çiçık, hınek	Biraz (cık)
66. Pıspor, pêzan, pêşekar, şareza	Uzman
67. Pêlav, sol, şekal	Ayakkabı
68. Pêlekan, pêpelûk, merdewan	Merdiven
69. Pêşajo, pêşeng, rêber	Öncü
70. Pêşberi, diji, hemberi	Karşı (sında)
71. Pêxas, ebesor, bêrêdayi	Lumpen
72. Pêwist, hewc, ferz	Zorunlu
73. Rewşenbir, ronakbir, zane	Aydın
74. Rınd, baş, xweş, ciwan, qeşeng, belew	Güzel
75. Rûpel, belg, pel, gela	Yaprak
76. Sekem, arsim, sermagirtın	Grip
77. Serok, serek, pêşrew, serwêr, serkar	Başkan
78. Sinor, xet, tıxûb	Sınır
79. Şaşi, xeleti, çewti, nerasti	Yanlışlık
80. Şagirt, xwende, suxte, xwendekar	Öğrenci

81. Taybeti, xazma, nemaze, ilahi	Özellikle
82. Tekuz, rêkûpêk, gihişti	Olgun
83. Tenik, zırav, barik, tital	İnce
84. Tevlihev, hevalandi, kerdige	Karışık
85. Texlit, tehr, cure, awa, dıruf, teşe, celew .	Biçim
86. Tomeri, hemû, gişt, tevayi, hevra	Birlikte
87. Xelat, diyari, pêşkêş	Hediye
88. Xwendegêh, zanîngêh, dîbîstan	Okul
89. Xerman, bêder, gêre	Harman
90. Xebat, kar, şuxul, pêşe	İş
91. Xemgin, rûsar, berxweki, dilşikesti	Üzgün
92. Xulam, berdesti, pişkari	Hizmetçi
93. Wer, wusan, awa, wilo	Öyle
94. Wêne, suret, nîgar, şıkıl	Resim
95. Wêran, kavıl, xopan, dêris	Yıkık
96. Uşe, gotın, peyv, gılı	Kelime
97. Veqetandin, cihêkırın, cudakırın	Ayırma
98. Zahf, pır, gelek, zor	Çok
99. Zivar, neçar, tengezar, desdteng	Yoksul
100. Zirek, jir, xebathez	Çalışkan



... TEFİK WEH Bİ Ç Ū SER HEQİYA X WE

Pısporê zımanê kurdi, zanê û welatparêzê mezın Tefik Wehbi beri çend heftan lı Londonê jı nav me bar kır û çû dılovaniya xwe. Dı warê pêştabırına zıman û çanda kurdi da keda wi pır derbaz bû, gelek xebatên hêja jı me ra hiştın.

Tefik Wehbi dı sala 1891'an da lı Suleymaniyê jı diya xwe bû. Wi lı İstanbolê û Bexdayê zanîngêhên leşkeri da xwend. Dı navbera salên 1944-1946'an da bû wezirê aboriyê û dı sala 947 an da jı lı Iraqê bû wezirê tenduristiyê û karên cıvaki. Heta sala 1956'an ew dı nav parlamentoyê Iraqê da cih digre.

Pêşekzan û mamosteyê mezın zımanê İnglizi, elmani, frensi, erebi, farsî

tırki û kurdi zanıbu. Dı warê zımanzaniyê da pır jêhati bû, nêzkaya 20 efrandinên wi, dı vi wari da hene weki:

- Destûra Zımanê Kurdi (1929)
- Xwendevanê Nav û Deng (1933)
- Ferhenga Erebi-Kurdi (1956)
- Gramatika Kurdi Bı Erebi (1956)
- The Origins of the Kurd and Their Language (1964).

- Kurdish-English Dictionary (1966) bı C.J.Edmonds tevayi ev ferhenga derxıstiyê.

- The rock-sculptures in Gunduk cave (1983) lı Swêd ev pirtûk çap bû.

Tefik Wehbi dı navbera salên 1958-1984'an da lı Londonê jiyina xwe buhurandiye. Dı roja 13.1.1984'an da ce nazê wi lı çiyayê Piremegan lı Kurdistanê Iraqê hat definkırın.

9' SALIYA PSKT

Partiya Sosyalist a Kurdîstana Tirkîyê, isal kete 10-saliya xwe J1 ber tîjikîrîna 9 salên partiyê, l1 pîr cihan, cîvin û şahiyên piroziyê hatin amadekirin. J1 van şevan yek ji, l1 bajarê Stockhol mê d1 roja 30.12.1983'an da çêbû. D1 vê cîvinê da Sekreterê Partiyê Kemal Burkay b1 dîr û dirêj baweriyên xwe l1 ser cihan û welêt, pêşkêşî mêvanan kîr. Paşê seydayê mezîn Cigerxwin peyîvî. J1 aliyê dîn d1 vê şevê da çend dengbêjan kîlam gotin, komên reqasê folklorî kurdi pêşkêşî mêvanan kîrîn. Komeke zarokên kurdi ji, d1 vê şahiyê da beşdar bû.

Pîştî belavbûna şevê, kovara Roja Nû, b1 sekreterê Partiya Sosyalist a Kurdîstana Tirkîyê Kemal BURKAY ra, hevpeyvinek l1 ser çand, huner û zîmanê kurdi pêkani. Em vê peyvinê, l1 jêr pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.

ROJA NÛ

B1 Sekreterê Partiyê Kemal BURKAY ra Hevpeyvin



PIRS: Çawa tê zanin Partiya Sosyalista Kurdîstana Tirkîyê d1 nav gelek salan da, j1 bo pêştabîrîna çand û zîmanê kurdi gelek xebatên hêja pêkaniye. L1 ser van rojên buhîrî, hun dîkarîna çend tîştan bêjin ?

BERSIV: Partiya me d1 dawîya sala 1974, 31'ê Çileyê pêşîn da saz bû. Me sala dînê dest b1 nivîsandîna zîmanê kurdi kîr (d1 Riya Azadî da, hejmarî heftan da). Pîştî vê d1 her hejmarekî kovarê da beşek b1 kurdi derket. D1 wê demê da nivîsandîna û belavkirîna kurdi l1 Tirkîyê ne tîşteki hêsan bû.

D1 dawiya dema Osmaniyan da -destpêka qurna 20'a da l1 Stembolê hın kovar û kitêbên Kurdi -wek kovara Jin, diwana Melaê Cızri-çap bûne. Lê Komara Tirkîyê, weki baş tê zanin, hebûna gelê me tucar nas nekîr û zîmanê me jî b1 temami qedexe kîr. Yeki ku kitêbek b1 zîmanê Kurdi, an l1 ser Kurdan hatiye nivisandin, d1 malê da b1-hata ditin dîçû ber dara sêpiyê.. Bona vê yekê, l1 Tirkîyê zîmanê me yê nivisandi demeke dirêj weki hate birkîrîn, çanda me şunda ket.

Cara ewlin d1 sala 1957-58'da l1 Diyarbekîrê d1 rojname Ileri Yurt (Welatê Pêş) da Musa Anter d1 nav nivisandinên tirkî da go-tinên kurdi derbaz kîrîn û kîlamek jî b1 temami b1 kurdi nivisand ew bû tîştêki mezîn! Bona vê yekê dawe lê vekîrîn û pîştî jî girtin...

D1 sala 1963' da kovara Deng derket. Navê xwe kurdi bû û tê da piçek jî kurdi hebû. Jê ra firsend çênebû ku j1 çar hejmarî zêde derkeve. Hemû nivîskar û berpirsiyar hatin girtin û hukumetê bo wan got ku dîxwazî dewleteke Kurdi çêbîkîn..

Pîştî vê, heya 12 Mardê, sala 1971, weşanên ku b1 kurdi derketin Birîna Reş (a Musa Anter), Gramera Kurdi (a Kemal Badîllî), E-lifba Kurdi (a Mehmed Emin Bozarslan) bûn. Ew hemû jî hatin kom-kîrîn û derheqa wan da dawe vebûn.

J1 vê heya derketîna Riya Azadî tîştêk b1 Kurdi çap nebû. Me kême kême destpêkîr û hêdî hêdî pêşva bîr. D1 sala 1978 da me Roja Welat b1 Kurdi û Tirkî derxist. Roja Welat tesîrek mezîn kîr l1 ser bîlîndbûna tevgera azadî û her usa jî l1 ser pêşveçûna, firehbûna zîmanê nivisandinê.

D1 Riya Azadî û Roja Welat da gelek bend derketin l1 ser nivîskarên Kurd yê b1 nav û deng, l1 ser dirok û çanda gel.

Her usa jî neşîrxana Riya Azadî gelek kitêb derxistin b1 kurdi an jî l1 ser dirok û zîmanê kurdi.

Kitêba Nikîtin "Kurd", ya Îsmet Şerîf "B1 Çavên Seyyahên Rojhî-lat, Kurd û Kurdîstan (b1 zîmanî Tirkî) çapbûn.

Gramera Kurdi a Kamran Bedîrxan (a biçûk), Destana Memê Alan (berhevoka Lescot), Şivanê Kurd (Ereb Şemo), Kulîlkên Çiya (Eske-rê Boyik) b1 kurdi û tirkî hatin çapkîrîn.

L1 der welat jî, xasîma l1 Elmaniya Federal û l1 Swêd hevalên me, rêxistinên hevkarê Partiyê d1 aliyê zman û çand da karên hêja kîrîn. Kovarên kurdi derxistin û gelek kitêbên kurdi çapkîrîn.

Ne tenê b1 aliyê nivisandinê, b1 gelek civînên çandî jî Partiya me xîzmetek mezîn kîr bo zman û çanda Kurdi. Newroz l1 Tirkîyê, çara pêşîn b1 rêberîya Partiyê hat pîrozîkîrîn b1 şeveke çandî l1 Stembolê. Pîştî wê l1 gele bajarên Kurdîstanê û l1 bajarên mezîn yê Tirkîyê bo pîroziya Newrozê şahî çêbûn û gelek civînên çandî yê din. Van civîn û şahîyana jî tesîrek gelek mezîn kîr l1 ser bîlîndbûna bir û baweriyên rîzgarîxwaz û hîşyarbûna gel.

B1 vî awayî gelê me yê Kurdîstana Tirkîyê xweş hîşyar bû ku ne wek gotîna kolîdaran e; Kurdi zman e, kevn e, gelek hatiye nivîsandin û meriv dikare pê bînivîsîne; diroka gelê Kurd kevn e û çanda me dewlemend e. B1 vî awayî b1 hezaran insanê me xwendin û nivîsandîna zmanê xwe hînbûn.

Karê Partiya me l1 ser zman û çanda Kurdi, b1 rasti jî karekî hêja bû. Partiyê vî alî da gavên mezîn avêtin û d1 diwarên dijmin da qulên mezîn vekîrîn.



Zordesti l1 ser xebata me ji her hebû. Hevalên me hatin girtin, kovar, rojname û kitêbên me hatin komkirin. Lê me b1 xurti berê zordestan da û karê xwe ajot. J1 ber ku em ne yek-du kes bûn, par tiyek bûn.

PIRS: J1 der karên politik, wek em dizanin, d1 warê edebiyata Kurdi da ji xebatên we hene. B1 baweriye we, d1 navbera karên politik û karên çandi da ç1 peywendî hene ?

BERSIV: Ez d1 dema xortaniyê da b1 karên edebi gelek mijûl bûm. Wexta ku min b1 girani xwe da ber siyasetê ji dev j1 karên edebi berneda. Lê iro j1 karên edebi ra wext nabinim; j1 ber ku karên Partiyê giran in.

Senet, çand ne tenê karê senetkaran e. Merivên siyasi ji, yên ne siyasi ji dîkarin pê mijûl bin û divê mijûl bin. B1 baweriya min, merivek ku b1 siyasetê mijûl nebe, bo wi kêmasiyek e. Jiyana civaki da tesira siyasetê l1 ser hemû kesan heye. Eger em bîndest in, xebatkar in, divê em siyasetê bîzanibin, bo rîzgariya xwe kar bikin. Lê senet û çand ji bo insanan e. Ew ji b1 aliyê moral merivan dîgihine, dîxemilîne. Yê ku qet guh nade karên senetkari û çandi, bo wi ji kêmasiyek e.

Xasîma bo me siyasiyên Kurdan, ku dijmin zman û çanda me qedexe kirîye, dîxwaze gelê me b1 aliyê moral bê çek bihêle, divê em zê-tir guh bidîne karên çandi. Karê çandi ji bo me çek e d1 şerê rîzgari û azadiyê da.

Min b1 xwe, karê çandi tîm da xîzmeta karê siyasi, ango da xîzmeta rîzgariya welat û bîndestan.

Divê meriv ne karê siyasi, ne ji yê çandi biçûk bibîne. Ew herdu b1 hevra girêdayî ne, xasîma bo mîletê bîndest, wek me.

Iro hin kesan dîbinim, xwe şoreşgerên mezî dîhesîbin û karê çandi biçûk dîbin. Ew siyasiyên nezan in û b1 vi awayî dîxwazî nezaniya xwe veşêrin. Lê hin kes ji hene, tenê qîmetê dîdîne karên çandi, siyasetê biçûk dîbin û weki ew dîkarî tenê b1 rîya karên çandi welat rîzgar bikin. Ew ji şaşiyek mezî e. Xebata çandi çiqas hêja be ji tucar nîkare civê xebata siyasi bigre. Divê ew d1 xîzmeta xebata siyasi da be. Xebata esasi ya siyasi ye, mirov dîkare b1 vê xebatê milyonan b1 rêz bike, b1 hev gihîne, zora dijmin bibe û hukûm b1 dest xe.

Teçruba me Kurdan ji xweş nîşan dîde ku merivên "serbixwe" çiqas jêhati bin ji, b1 tena xwe nîkarî karê çandi baş bîmesînin. Bo vi kari ji yekîti hewceye, rêxistî hewce ye. Xîzmeta baş ku Partiya me d1 karê çandi da kir, bo vê ji misalek hêja ye.

PIRS: Hûn l1 ser rewşa edebiyat û zmanê kurdi, l1 ser pêştaçûyî na wan d1 wan rojên iroyin da, ç1 dîkarî bîjin ?

BERSIV: Edeba Kurdi d1 van 60-70 salî dawî da l1 Kurdistan Iraqê û l1 nav Kurdên Sovyêt da pêşva çû, l1 her du alî gelek hostayên zman û edeba kurdi gihîştin. L1 Kurdistan Iraqê, destpêkê vir da l1 ser zman û çanda kurdi zordestiyek giran tune bû û Kurdan pîr-hîndîk b1 zamanê xwe xwendin. L1 Sovyetiyê ji, şoreşê, wek hemû gelan l1 ber kurdan ji rê vekir û fîrsendên baş da bo pêşveçûna wan l1 aliyê civaki û çandi.

Lê iro gelek problem hene bo yekîtiya zmanê Kurdi l1 aliyê axaftin û nivîsandî. Ew problem d1 bîngehî da b1 rîzgariya welat û gel safî dîbin. Kingê welatê me rîzgar be, yek be, kurdi bibe zî-

manê resmi, hingê rê bî xurti vedibe bo yekitiya zman û pêşveçûna edeb û çanda Kurdi.

Kurdîstana Tirkîyê, jî ber zordestiya giran, dî aliyê pêşveçûna zman û edeba kurdi da zêtîr dereng ma. Weki mîn berê jî got, dî van salên dawî da lî Kurdîstana Tirkîyê jî gele guhartin çêbûn. Îro bî hezaran insanê me xwendin û nivisandina zmanê xwe dîzanin. Ew yek, rê-olaxên nû vedike bo pêşveçûna zman û çand. Gele kesên nû hez dikin bî kurdi bînivîsinin tîştên edebî.

Lê divê bona pêşveçûna zman û edeba Kurdi meriv guh bide ser du tîştên esasî :

Yek paqîşîya zman e. Divê zmanê nivisandinê jî zmanê axaftinê dîr nekeve. Ango tîştê ku em dînivîsinin xelkê me bikare fêr ke. Çavkaniya zmanê me zmanê gundiyan e û dewlemend e. Divê em xwe bî westînin jî vê çavkaniyê hinbîn.

Hîn kes hene, wexta gîlî-gotînekê nîzanin, xwe nawestînin, lê nagerin, xelkê me bo vî tîştî çî dibêje ? Ew kesana, pîr caran jî ber xwe gotînan derdixin, çêdikin û weki ew zmanê me dewlemend dî kin!

Lê bî rastî, zman xîzan û tevlihev dikin. Rast e, hîn gotînan hene belkî zmanê me da kêr in, divê em wan jî yêr heyî derxînin, an jî nu va çêbîkin. Lê divê ew jî gora usul û erkan bibe.

Yê dînê jî ev e ku heweskar lî nav û dengekî erzan negerin. Bona hinbûna zman û çanda kurdi, her usa jî bona hinbûna çand û edeba dinyayê xwe bîwestînin. Meriv bê westan tucar nîkare bibe şoreşger û nîkare bibe senetkar.

Kurdên Tirkîyê dî aliyê edebî da hîn rîya xwe baş venekirîne. Hîn dî aliyê şêr, serpêhati, çîrok, zargotînan, teatîr û roman da efrandînan kêr in. Bo vê yekê xebateke birewer û bê westan hewce ye.

PIRS: Jî bo pêştabîrîna van karan, Partiya Sosyalîsta Kurdîstana Tirkîyê, dî rojên pêşda çî armanc û rê dane pêşîya xwe ?

BERSIV: Weki mîn jor da jî got, karê çandî beşek e jî karê me, jî karê siyasî va girêdayî ye. Xebata me bo pêşvebirîna zman û çanda kurdi nah şunda jî wê neseke.

Karên Partiyê ku sal bî sal fîreh û mezînan dînin, tesîra xwe lî ser zman û çanda gel jî nîşan dînin. Sal bî sal hevalên nû dîghên û dî aliyê nivisandinê da, dî karên çandî da pêşva dîçîn. Îmkanên me ku zêde dînin, em dikarin zêtîr kîtêbên kurdi çap bîkin.

Kovarên me, yan beşekî wan kurdi ye, yan jî bî temamî kurdi derdikevin. Gelek bend (mîqale) bî kurdi tînan nivisandin û xweş nîşan dînin ku kurdi bes e, dewlemend e bo rêvebirîna karên siyasî lî aliyê axaftînan û nivisandinê da.

Du
Biranin

ARAM XAÇATURYAN

Îsal, sazband, kompozitor û hunermendê mezın Aram Xaçaturyan dı keve 80-saliya xwe. Kompozitorê nav û deng çawa tê zanin iro lı hemû cihanê pır baş tê naskırın. Wi dı 19'saliya xwe da merifet û jêhatiyê xwe nişan da. Paşê dı warê muzikê da gelek gavên pêş avitiye. Wi gelek efrandinên nemır pêşkêşî gelê xwe kırıye, wek "Spartak" û "Gayane"....

.....
".... Ew şam-şureta sazbandiya gelê me ra rınd nas bû, def û dewetên kurdi bı çavên xwe ditibûn û evê yekê nıkarıbû bandûra xwe lı ser dıl û ruhê wi yê nazık nehêle. Pırsa kurdan bona kompozitorê mezın pırseke hızkırı bû...."
.....

Nura CEWARÎ

Hunermenda Kurd

.....
".... Hunermendê jêhati, nav û deng rınd haj sazbandiya gelê kurda ji hebû, alikariya wê dıkr, ku sazbandiya me pêsta here. Ew çawa lı vır, wusan ji, jı welatê me der gelek caran rasti kurdan hatiye, bı wan ra deng kırıye, bı serfıraziye wan va şa bûye sazbandiya gelê kurd va ruhdar bûye. Hema ev hızkırına wi ya kûr berbı gelê me, dı balêta wi ya "Gayanê" da hat nişandan...."
.....

Karlanê ÇAÇAN

Nıviskar

50-SALIYA ARAMÊ TIGRAN

Dı roja 21.1.1984'an da 50 saliya dengbêj Aramê Tigran tiji bû. Wi zarotiya xwe nav kurdên Suriyê da derbaz kır û zımanê kurdi baş fêr bû. Kal-bavê Aram bı xwe ermenine, lê ew wek dengbêjeki kurd tê zanin. Lı Kurdistanê navê Aram pır belav bûye. Beri çend salan Aram jı Kurdistana Suriyê hat Ermenistanê û heta niha ji lı vır dımine.

Bona tıjkırına 50.saliya wi dı roja 22.1.1984 lı bajarê Xaçatur Abovyan cıvineke pirozkırınê hat amadekırın. Dı vê cıvinê da gelek niviskar, rojnamevan, zane, berpırsiyarê radyoya kurdi, bıra-pızmamên wi û gelek mêvanên dın beşdar bûn.

Zaneyê dirokê Celilê Celil ev cıvına vekır û paşê dor bı dor gelek

kesan lı ser Aramê Tigran deng kır. Bona karê Aramê Tigran nav sazbandiya kurdi da Wezirê Eşo peyıvi. Paşê Titalê Huseyn, Kınıyazê İbrahim, Cemila Celil, Mirazê Evdo, Tımurê Xelil û kesên mayin raman-baweriyên xwe lı ser dengbêjên hêja pêşkêşî mêvanan kırın.

Van kesan dane kıvşê weki keda Aramê Tigran dı nav hunerê sazbandiya kurdi da pır derbaz bûye. Wi wusan ji helbesta Ahmedê Gogê "Fıkran ez bırım çiyayên me" û helbesta Sehidê İbo "Xwezıl disa zar bûma" xıstiye stran distırê, bı naveroka xwe vapır nêziki ruhê gelê mene.

Em jı Aramê Tigran ra xweşiyê dıxwazın.

HESENÊ USO

Rojnamevan

ELİYÊ EVDILREHMAN KIYE ?



Gava gılı tê ser ronakbirên Kurd, beri her tîştî em bî çaveki cuda lî wan dinêrîn, çika wi camêri dî hêla pêşketîna gelê xwe da çî kîriye, karê wi çiyê, jî aliyê gulvedane edebiyat, folklor, çand û dî warên dîn da çî rol listiye, pêwîste em vê yekê raçav bî kîn.

Nivîskarê Kurd Eliyê Evdîlrehman dî vi wari da heta niha xebateke bê westan pêk aniye û niha jî ev karana berdewam dîkîn.

Serpêhatiya jiyana wi dewlemende. Pêşiyê emê lî ser pîrsa jiyana wi bî kurtî bîsekînin, dûra emê bî hûrgîlî lî ser karên wi yê edebî bîsekînin.

Nivîskarê kurd dî sala 1920'an da hatiye cihanê. Dî sala 1926'an da, ew tevi 450 malên êla birûka jî welatê Romê, navça Wanê, jî dest zîlm û tedayan dîrevîn, paşê tîn bî mîhacîrî lî welatê Sovyetîstanê ciwar dîbîn. Lî Azerbeycanê lî hêla şawlika dihêwirîn lî wîr jî ew hîni xwendî û nivîsandîna zîmanê kurdi dibe.

Eliyê Evdîlrehman dî sala 1933'an da dîkeve zanîngeha kurdi û beşa mamostetiyê dîxwîne û dî sala 1937'an da ew vê beşê tamam dî ke. Ew lî ber destê mamoste Heciyê Cîndî, Eminê Evdal, Tital Muradov hîni zîman û edebiyata kurdi dibe. Jî wan sala despêdîke, efrandinên Eliyê Evdîlrehman rojnama kurdi "Riya Teze" da tîn çap kîrîn û ev yeka dî nav xwendevanên kurd da şabûnekê peyda dîke.

Pey tamamkîrîna zanîngehê, ew dî gundên kurda da derbasi ser xebatê dibe, zarokê kurdan hîni xwendîne dîke. Dûra şerê cihanêyî duwemîn da, wek partîzan dîjî dîjîmînê devbîxwîn bî mîrxasi şer dîke û keda xwe ya hêja dîke nav serketîna Ordiya Sovyet.

Paşî şer Eliyê Evdîlrehman lî Bakuyê dîkeva Instituya pedagogiyê û dî sala 1949'an da bî serfîrazi vê beşê dîqedîne, hema wê salê da jî, dî navça Bazargêçarêda dibe serokê para xwendîna gel. Dî sala 1953'an da lî Rewanê, dî wezîreta Ronkayê da dibe inspektore dîbîstanên kurdi û azarbeycanî. Jî sala 1955'an heta niha ew dî redaksiyona rojnama "Riya Teze" da kar dîke. Bî taybetî dî nav wan salan da ew destpêdîke, serhati û helbestên kurdi dînivîse.

Berî çend rojan ez bûm mêvanê wi û mîn jî hêvi kîr ku, ew çend gotîna lî ser kar û barên xwe jî bo xwendevanên "Roja Nû" pêşkêş bîke, wî ev yeka bî dîlgermî qebûl kîr.

TİMURÊ XELİL

PIRS: Tu dîkari lî ser efrandinên xwe yê çapbûyî çend gîliyan bêjî ?

E.EVDILREHMAN: Pirtûka mîn ya pêşîn "Xatê Xanîm" tê navkîrînê. Ev pirtûk dî sala 1958'an da hat weşandî û bî taybetî lî ser jiyana kurdên Tirkîyê hatiye nivîsandî. Vê hukmeta bêbext çî aniye serê kurdan ev yeka naveroka vê pirtûkê pêktîne. Dîroknivîsê tîrkan dîbêjîn: "Welatê me da kurd tunene, tîrkên serê çîyan hene, wa na zîmanê xwe yê zîkmakî bîrkîrîne, demê bê ewê zîmanê xwe yê dê, bî tîrki gotîna bîkîn" lê belê, Romê da bî milyonanî kurd hene, ew

ji dixwazın xweyê edebiyat û çanda xwe, weki zarokên wan bî zîmanê xwe bixwinin, seroktiyê lî hebûnên xwe yê sererd û bînerd bîkîn ku dewlemendiya wan û diroka wan jî di cihanê da bê naskirin.

Hukmeta Tirkîyê ew rê û dirb lî ber kurdan dadane û dixwaze ev gelê rohilatê wunda bibe, bike dil û xulamê xwe. Lê wana hîlnedane ser hesêb ku cihan kurdan nav dîke lehengê binê derya (behr, dengîz) şêrê çîyan, kurd tu wext lî ber zakonên Romê qels nebûne, timê jî bo azadi û serbestiya xwe şer kiriye. Ev tekoşin roj bî roj gur û gumreh dibe. Wan çenga da jîna kurd çek hildida û lî dij dijmin bî mêrani ber xwe dida.

Aha hema mêrxasê vê pirtûka min jîna kurde mêrxase. Dema mêrê wê dimire, ew serkariyê lî êla xwe dîke, bona azadî û serbestiyê lî Dersimê lî diji zevtkarên bênamus û bêşeref şer dîke. Ew bî kîrînên xwe va çavê hukmeta tirkan ditirsine û wana zendegirtî dîhêle. Fêrîzi û egitiya wê serkara kurda jî ne ku tenê lî Tirkîyê lê her waha welatê cînar jî bela bibe, wek mêrxasa kîlama davêjîne ser wê û ev strana gihiştîye heylo vê dewra me. Bona wî kari ku kurdên Dersimê bî serokatiya Xatê Xanimê cara dudu ranebîne di jî hukmeta Romê gelek efûkirin û baxşandina didîne kurdên hêla Dersimê.

Pey vê pirtûka min ra, ya bî navê "HIŞYARBÛN" çap bû. Ew bî taybetî lî ser Kurdistanê Îranêye. Şerê Kurdên Îranê, jî bo avakirîna komara Kurdistanê bî serokatiya Qadî Muhamed nivê vê pirtûkê girtiye. Nivê wê pirtûkê helbestên, ew jî lî ser rewşa kurdên Îranênin.

Di pirtûka "DÊ" da serpêhati hatîne ciwarkirin, Naveroka van serpêhatîyan lî ser kurdên Yekitiya Sovyetin, ku ew jiyana têr û tîjî derbaz dikin. Wê da her wusan jî serpêhatiyên lî diji erf-edetên nebaş û kevneşopiyên ziyankar cih girtine.

Romana "GUNDÊ MÊRXASA" jî bo serhildana Şeyx Seyit hatiye nivîsandin, dema hukmeta Tirkîyê ev serhildana bî hoviti hincirand, vê carê dest bî xezakirin û kor-pûçkirina kurda kîr, lê kurdan disa bî cengawerî dest bî şerê diji Romê kîr. Çiyayên Kurdistanê destên xwe da xweyî kirin, ne hiştin ku decal bikevîne wîr. Helbet mêrxasê vê Romanê gel bî xweye û lawê wê jî paşîla gel derketine.

Pey vî şerî ra weke 5700 malê kurda mîhacirî welatê Sovyet kirin, hukmeta şêwrê derî û dergê xêr û xweşiyê xwendin û pêştaçûyî nê ber wana vekir, zarokê wan bî zîmanê xwe yê dê xwendin. Kurdên mîhacir tevî birayên xwe yê ûrîs, ermenî, gurcî, azerî û gelên mayî lî diji neyarên civakî şer kirin û welatê xwe dane paqîşkirinê. Ew ketine qama jiyana nûh, azad û bextewar.

PIRS: Kerema xwe tu çend gotina jî bo wê yekê da bêji, çîka tu niha lî ser çî dixebitî û zûtîrekê tûyê bî çî va xwendevanan bîdi şakirîne ?

E.EVDILREHMAN : Bawer bîkîn eva sala şeşane, weki ez ser romana xwe ya dirok-bedewtiyê bî navê "Ser Çîyan da" dixebitîm. Eva ne-maze lî ser şerê kurdan, di nav salên 1928-1930'an lî bereka Gîridaxêye, weki kurdan nava wan salan da lî pêşa Gîridaxê şereki çawayî giran danîne û bî hezaran leşkerê Romê û serbazên wê çawa hatîne hincirandin, ev pîrsa naveroka romanê pêk tine. Ev romana min amadeye, tenê hêviya çapkîrîneye.

Bîlî wê, ez niha disa ser romana "Murtule Beg" ê dixebitîm, çawa tê zanin ew xweşmêrê navça Muksê bû.

Pirtûka "Gulîstan" di sala 1974'an da lî Rewanê hatiye çapkîrin. Wê da çend serpêhati û helbest lî ser Leninê mezî, şoreşa Oktobêrê û evîne hene. Pareke wê pêşkêşî Kurdistanêye ku jî bo şerkari-

ya kurdan lı dıji zevtkaran jı bo mafê çarenûsi û serxwebûnê.

Pirtûka "Hebandın" lı bajarê Bakuyê bı zımanê Azeri, dı sala 1975'an da hatiye çapkırın. Naveroka wê bı taybeti lı ser birati û dostaniya gelên welatê Sovyetêye. Serpêhatik lı ser Ahmedê Xanê hatiye nıvisandın. Dı vê pirtûkê da wusan jı çend helbestên evini yê ciwar bûne. Bı gıliki mın xwendevanên azeri bı erf-edet, rabûn rûniştın û efrandinên kurda ra kırıye nas, weki gelê kurd dıkare bı mêrxasi şer bıke, ber dijın qels nebe û dıkare edebiyata xwe û çanda xwe jı pêşta bıbe, nava edebiyata cihanê da naveki hêja bıgre.

Mın çar sala dı nava desta partizana da lı dıji almanên şerbaz berxweda, tevi bırayên xwe lı dıji faşistan cenga jıyin-mırinê da niye û angori hêza xwe jı nehiştiye weki dijın welatê me zevt bıke. Pirtûka mın bı navê "Bıranın û Serhati" bı taybeti lı ser vê pırsêye. Dı nav serhatiyan da jıyina zaroktiya mın cih gırtiye.

Beri çend mehan berevoka mın ku têda gelek helbesten cih gırtiye bı navê "Hesreta Mın" der çû. Wê da gelek helbest hene ku mın avitiye lı ser kurd û Kurdistanê.

○○○

ROMAN



ÇIYAYÊN BI XÛNE HATINE AVDAN

BI

Pêşgotına M. S. Lazeref

M. NEBEZ

"Çiyayên Bı Xunê Hatine Avdan" navê romaneke kurdiye, nıviskarê vê romanê kurdeki Suriyêye, ew bı xwe niha lı Yekıtiya Sovyet dımine û navê wi BAVÊ NAZÊ'ye. Cara pêşin Rızo ev romana jı zımanê kurdi wergerandiye bı zımanê erebi û dı sala 1978'an da hatiye weşandın. Paşê jıneke ûrıs ev romana jı zımanê erebi wergerandiye bı zımanê rûsi û dı nav 180 rûpelan da hatiye çapkırın. Romana Bavê Nazê bı zımanê rûsi tevi roman û çirokên dın jı zımanên engli-zi, hindi, mongoli, yapani, vietnami, dari û hın zımanên dın va hevra dı nav pirtûkeke fıreh bı navê "BEREVOKA ROHILATÊ" da hatiye çapkırın.

Jı bo vê romanê, Prof.M.S.Lazeref pêşgotıneke pır hêja nıvisiye û têda lı ser rewşa kurdan sekıniye. Çawa tê zanin Prof.M.S.Lazeref lı ser pırsa kurdan zane û pısporeki nav û denge. Tenê,dı sala 1972'an da lı ser beşeke diroka kurdan vekolineke pır zanisti amadekır û da çapê. Ev xebata wi jı 472 rûpelan pêk hatiye. Navê wê "PROBLEMA KURDAN, DI NAV SALÊN 1891-1917". Jı ber gıringi û hêjahiya vê pêşgotına Prof.M.S.Lazeref, em wê jı rûsi werdigerının zımanê kurdi û naveroka vê pêşgotınê pêşkêşı kovara "Roja Nû" dıkin.

D1 rûpelên romana niviskarê kurd û nûjenbar Bavê Nazê da tîştên taybeti xwe nişandîdî û hîn jî pîr xwendevanên Sovyetîstanê û cihanêra nehatîne nasîn, tevî bûyerên romanê dî rojên me yê nîha da derbaz bûne û jî sîno rê me jî ne dûrin.

Wusa lê hatiye ku mirovên ne pîrpor û ne pêşekar hindîk lî ser kurdan zanîn, cihder û belgeyên lî ser wan ne herdem rast û durûstî, qedera vi gelî dî dirokê da nemazeye, Kurd herdem cihê çavnîrîn û balkişan dîna mezîne, cara pêşîn, berî sê hezar sal lî ser kurdan hatiye gotîn û nivîsîn. Kurd lî rohilatê ketî bî destên împîratorên mezî, gelek mirovên gewre jî kurdan pêşengiyên kar û barên hukûmetan kirîne, wek Selhatî Eyûbî. Gelek helbestvan û ronakbirên kurdan hebûne. Lê kurdan nîkarîbûne hukûmeteke serbixwe jî xwe ra avakîrîna, jî ber ku hîn merc û nîr dîbûn kend û aloz lî pêşîya pêşketîna netewa wan, lî herderê û lî her cihî ew bîndest bûn.

Pêşketîna aborî, rewşenbîrî, rêzani jî bo kurdan pîr dijware, hejmara kurdan lî gor texmîna paşîn 18 milyonan (dibe heta 20 milyonan be) angî hejmara kurdan jî 3/4 welatên serbixwe dî koma yekîtiya netewan da pîrtîre. Kurdîstan dî ser 450 hezar Km² firehe, 2/3 welatên cihanê jî Kurdîstanê kêmtîr erdê wan hene. Kurdîstan bî samanên kêrhati va dewlemende, Kerukuk cihderê zêrê reşe û gîringîya xwe lî cihanê heye. Tevî Kurdîstan dî bî nîrên rêzani û dirokî yê dijwar ra derbaz bûye, gelê kurd herdem bî mîrani û nebezî jî bo azadiyê, bê wê tan tekoşîna xwe lî dijî bîndestîyê ajotîye. Jî ber vê yekê Kurdîstan bî welatê "Çîyan û Raperînan" hatiye navkirîn, tenê dî sedsalên paşînda, kurd bî dehan caran çek rakîrîne, lê herçar dijminên serbestîyê û serxwebûna kurdan xurtîr derdikevî, cihê Kurdîstanêyê stratejîk û gîring, rola xwe dî şîkandîna tevgera azadîxwaza kurdan da listîye, Kurdîstan cihekê xwe taybetî heye, bî çiyayên xwe neqîşkîrî wek kelakêye, navbendeke gîringe lî roavayê lî navçeya Asiyê. Jî ber van sedeman, welatên rohilata navîn, yê Kurdîstan nav xwe da

dabeşkirîne û destlatên koledar berxwedane wekî cihê xwe lî Kurdîstanê bîgrîn. Jî van hemû hêzan ra hewas bû wekî parvekîrîna gelê kurd xurtîr bî be, aborî, rewşa civakî û çandî şûndamayi bîminîn.

Bî vi awayî rewşa cihanê herdem, bû aloz û dijwarî lî pêşîya berxwedana, gelê kurd jî bo azadiyê û serxwebûnê. Ev dijwarîyan heta roja îro jî hene. Ev dijwarîyan jî aliyên sistemên şovenîst, burjuvazî û leşgerî, yê çend welatên rohilata navîn, hatîne çekîrîn, yekser yan jî ne yekser, emperyalîst jî alîgirên wan welatanî, heta ku ew daxwaz û meremên xwe dî navçê da bîparêzîn. Eger carekê pîrsa netewa kurd bî demokrati nebe, tîkoşîna bo aştiyê û pêşketîna civakî lî navçê, bîsernakeve.

Serketînen pêşîn dî xebata gelê kurd da ya dademende diyare. Pîştî şe rê cihanê dudîyan lî Iraqê bî mafê gelê kurd xwemuxtariyê hat nasîn, lê heta nîha ew pînasîna bî pêknehatiye Dîjminên gelê kurd hîn bî hêzî û lî welatên dî, lî rohilata navîn, dijminayeti lî dijî tevgera kurdi her bî hêztîr dibe û bî hemû şeweyan zor dariyê lî kurdan dîkîn.

Dî dema nîha da, gava rohilata navîn bûye yadigarê fitna împîrsalîst û kevneperestan, disan jî, hukûmetên ku Kurdîstan xîstîne bî destên xwe, çare jî pîrsa kurdi, û mafa netewî ra lî hemû beşên Kurdîstan û lî ser bîngêhen dademendî nabinî û bî pêknînin. Dî rewşeke wusan da, roman lî bajarekî mezî lî Kurdîstana Tîrkiyê da derbaz dibe. Pêwîste bî kurdi vi beşê Kurdîstanê bî xwendevanên Sovyetîstanê da bîdî nasîn. Kurdîstana Tîrkiyê lî rohilata Tîrkiyê dîkeve, 230 hezar Km² erdê wê heye, ne kêmtîrî 9 milyon rûniştvan lî Kurdîstana Tîrkiyê dijî, pîraniya wan lî Kurdîstanê ne. Ev beşa Kurdîstanê perçê herî gîringtîre. Rewşa kurdên Tîrkiyê jî aliyê pêwendîyên aborî, rêzani û çandî da zor dijware, navçeyên Kurdîstanê jî hemû navçeyên welat şunda manê. Lî Tîrkiyê xweş diyare, çawa zordestîya şovenî lî ser netewa kurd jî aliyê desthilata navbendî û navçeyî da tê kirîn, lî gor destûra Tîrkiyê, Kurdan bî Tîrkên çîyan dîdî nasîn.

Mafa gelê kurd tûneye, weki rojnaman û pirtûkan bî zîmanê xwe bîweşînî û bîxûnî, dixwazî kurdan rakî, lê kurd bî hîşmendî û zanebûn pîştgîrî û pawana xwe dîkî. Tevera Kurdistana Iraqê û Iranê, tekoşîna kurdên Tirkîyê hîn pirtîr germ dîke. Tevera kurdan lî Tirkîyê lî ser bîngêhên rêzani û aboriya welat bejn dîde. Bîhâbûn, bêkari, têrorîsta rastrewî û çeprewî lî Tirkîyê bî pêşta dîçe û pirtîr dibe. Pîrsa Kurdi lî Tirkîyê dî jiyana rêzaniyê da gîrînge, çarelêkîrîn lî ser bîngêhên demokrati, bûye pîrs û karê rojê jî hemû gelên Tirkîyê ra.

M. Lazerev dî beşê dudîyan, dî pêşgotînê da dînivîse, weki romana Bavê Nazê bî taybetî asteng û problemên Kurdistana Tirkîyê bî xwendevanên Sovyet dîde nasî, danasîna naveroka romana Bavê Nazê bê gûman gelek gewreye, ev kara, ne karekî zanîstîye, lê belê berhemekê edebîye.

Pêwendiyên civakî yê kurdan dî romanêda ciheki gîrîng standîne, ev berhema dî saya rastiya wê da, hevasê mirovantine, ne bî tenê jî aliyê edebî da, lê hîn jî ber gîrîngîya wê dî hîşyarbûna kurdan da, dîke ku kurd bî çalaki tekoşîna çîneyetî û rêzani jî bo destxîstîna mafê mirovayetiye bike, dî vîr da gîrîngî û nerxa romanê heye.

Roman bextê dijwar yê xortekî cotkar û kirêkar dîde nişan, ev xorta berxwe dîde weki jîyanekê nûh xwe ra ava bike. Roman lî ser du xalan hatiye beşkîrîn, yek lî ser jiyana mêrxasê romanêye, ya duwemî lî ser karê û tekoşîna mêrxasê çîrokêye. Nîvîskar bî kûrani pêwendiyên civakî lî gund û bajarên Kurdistana Tirkîyê, rabûn û rûniştînin kurdên Tirkîyê, xebata

çîneyetî, dijayetiya netewî lî Tirkîyê nîgar kirîne. Dî romanê da, rasti yê ku niha dî çîyayên Kurdistanê dâ hene, kevneperestiya kurdan, dijayetiya êlan û tolbîrîna xûnê tên ber çavan. Çawa ev kevneperestiya dî nav kurdan da heye û wusan jî lî Tirkîyê bî gelemperî heye.

Mêrxasê bîngêhî dî romanê da Çeto ye, destpêka zanebûna wî, ya gelemper û zanebûna rêzani lî cem Mamoste Siyamend çê dibe, Siyamend tê kuştîn lê bawerîya zanebûnê lî cem Çeto her berdewam dîke. Çeto bawer kir ku pêwîste xwe jî adetên kevî azad bike û xebata civakî da beşdar be. Çeto û Gulê jî hev hez dîkî, lê Çeto zane ku kevneperesti bê xebateke mezîna yê hîlanî û paqîkîrîn.

Bûyerê ku lî bajêr dîqewîmî, ciheki gewre dî romanê da dîgre, naveroka wê rêzaniye. Gava cotkar jî karên gund vala dîbî, ew dîçîn bajêr dîxebîtî û dî nav van kesan da, Çeto jî hebû, lê jî bo Çeto, bajar xwendegha dudîyan bû, lî wîr çanda xwe bîlînd kir û lî dîjî çewsandkaran û bîndestîyê xebat kir. Lî bajêr, jî dijayetiya hêzên pêşverû û kevneperestîye xuyakîrîn û baş dîde nişankîrîn, ku rêxîstînen ramani peydabûnê û dest bî perwerdekîrîna Marksîstîyê-Lenînistîyê dî nav çîna karkeran da kirîne. Xwendevanên romana Bavê Nazê, wê dî hîn ciyan da çend tîştan bîbînî weki dî romana "Dayik" da M. Gorkî da dîbînî.

Çîyayên bî xûnê hatîne avdan, ne bes edebîyate, lê dîroka Kurdistanê ya rojên îroyîne.

Em bî nîvîskar ra, şorên paşî lî vegerînin, ku çîyayên Kurdistanê gotînen xwe yê dawî nekîrîne.

ZEMAN ZEMANE
PIŞİK PEHLEWANE
DİK NOWEDARE
HEBAN TIJÎ NANE

QICO

M. ARARAT

Merıvek hebû, navê wi Qıco bû. Bavê Qıco axaki dewlemend, xwedan gund, mêrg û zevi bû. Çıma ku bavê wi ew her roj ber kine-kina germa havinê jı bo nanê palan dışande malê, rıka (hêrs) wi zaf jı bavê xwe dıhat.

Rojekê bavê Qıco zeviyê da jê ra dibê: "Here malê nanê palan bine!" De Qıco jı peşki nehês bû. Ça dıghêje malê, jı diya xwe ra dibê: "Bavê mın dıgot bıla çêlekê şerjêke û bıke qeli jı palan ra bışine. "Bavê wi qasekê dısene, dınhêre Qıco nehat, hespa xwe siwar dıbe, dıçe malê. Jı jına xwe ra dibê: "Keçê ne mın Qıco jı bo nanê palan şande cem te, ka te çıma neşand?" Jına wi dıbe: "Ka xwe dê qehra xwe te û Qıco bıke, te teme kırye ku ez çêlekê şerjê kım. Me jı şerjê kır, sitıl danin ser êgır û dest bı qelandınê kır, lema wusa derengi ket. "Bı wê gotınê ra bavê Qıco xwe dıghine sitilê, koze ağır hıldide pey Qıco dıkeve û davêje wi. Qıco koza êgır jı erdê hıldide û direve, dıçe nava zeviyê cem palan dıbe: "Bavê mın ev koza êgır şand, dıgot Ūrıs hatye bıla pale zeviyê bışewitının û bırevın werın. "Pale zeviyê dışewitının û tên cem bavê Qıco. Bavê Qıco dibê: "We çıma wusa mala mın xırab kır, zeviya mın şewitand?" Pale jı dibên: "Qıco jı me ra go". Bavê Qıco para dıde ser Qıco û kumê xwe davêjê. Qıco kumê wi jı erdê hıldide û direve dıçe gundê dın mala meta xwe dibê: "Metê, metê! Eva kumê bavê mın bı xwe jı ber mıripêye, dıgot bıla xwişka mın nesene, were ser mın." Meta wi dibê: "Lê zarên mınê çewa bı?" Qıco dibê: "Tu here ezê lı wan mıqate bı." Qıco bızına meta xwe şerjê dıke, tev zarokan va dıxwe û paşê çermê bızinê davêjê tendurê, derdıkeve dıçe.

Pır dıçe hındık dıçe, rasti siwareki tê dibê: "Siwaro! Ez pır time, ca bı kerema xwe hespa xwe bıde mın, herım pışt vi çiyayê avê vexwım û werım. "Hespê siwar dıbe, bı çargavi dıkeve rê dıçe cem şıvaneki dibê: "Şıvano! Ez vi hespi bı tase gırara niska dıdım. "Şıvan dibê: "Wusane tu lı pezên mın mıqate be, heya ez herım gund gırarê bı." Şıvan bı lez dıçe, Qıco jı pêz dıde pêşiya xwe dıçe cem gavaneki dibê: "Gavano! Ez hespa xwe û vi bıre pezi bı tase gırara nıskan dıdım." Gavan berê xwe dıde gund gırarê bine, Qıco wan dewarana jı dıde pêşiya xwe dıçe cem cotkareki. Wi jı bı gırara nıskan dıxapine, cotkar dıçe malê. Qıco nırê lı ser stûyê ga hıldide, seriki erdêda dıçıkine, seriyê dın jı qoloji hewa dıke. Tine boçıkên herdu ga jêdıke, yeki jêrê û yeki jı bı jora nır va dardadıke. Qasekê şunda cotkar tê, dibê: "Heywax gaki mın erdêda, yek jı ezmin da çûye. Ewi ku hate cem mın yeqın hezreti Xızır bû. Şıvan dıçe cem gavan, gavan dıçe cem cotkar dibên: "Werın em dewsa Qıco serast kın û herın wi bıgırın."

Qıco jı bı pez, dewaran va dıçe mala bavê xwe û deri dıxe dibê: "Bavo ca dêri veke ka mın jı tera çı anıye." Bavê wi dibê: "Wey kulê kuştı, tu disa hati! "Bavê wi deri vedıke, dınhêre Qıco bı kerı pez û dewar va hewşêye, dibê: "Ooo, Qıco evana gışt malê me nın?" Qıco dibê: "Erê" Bavê wi dibê: "Mın dızani bû, kurê mınê axıriyê da bıbe merıveki baş, hela keremke were hundır."

Dibe êvar, merivên ku Qıco ew xapandin, têne malê û dibên: "Em dixwazın pez û dewarên xwe." Qıco dibê: "Ayhay, hela işev bîbın mê vanê mın, ezê we sibê bî pez û dewarên we va rêkım." Dıxwın, vedı xwın paşê Qıco nivinê mêvana dadine û jı wan ra dibê: "Lê şertekı mın heye, ki şev nava ciyê xwe da bıke, ezê sibê rabım serê wi jêkım." Ew radızên, Qıco ji dıçe tase pışrûk çêdike û tine yek he sık pışrûk rodike nava ciyê hersêkan.. Berbanga sibê şıvan bı xwe dihese, dınhêre ciyê wi şıl bûye, gavan radıke, gavan dınhêre ciyê wi ji şıle, gazi cotkar dıkın dibên: "Hevalo! Rabe me nava ciyê xwe da kırye." Cotkar ber xwey dibê: "Aha wele, Qıco wê serê we jê ke." Paşê pê dihese, ku ciyê wi ji şıl bûye, dibê: "Hevalno! Rabın em birevın herın, hêki Qıco serê me jênekıriye.

Êvarekê bav û diya Qıco gotinên xwe dıkın yek, weki wê şevê Qıco bıkujın, ku pêşıra wan ji wi xelas be. Qıco wan giliyan dibıhi se û êvarê tine piyên noginê girêdide, dirêji nava ciyê xwe dıke û carcımê davêje ser noginê, bı xwe ji dıkeve pışt stêr. Nivê şevê bav û diya Qıco nermınga dıkevıne oda wi. Bavê Qıco şûrê xwe bılınd dıke û lê dıxe serê noginê jêdike. Qıco nişkêva jı pışt stêr derdıkeve, şûrê jı dest bavê xwe dıgre û dibê: "Teyê ez bıkuj tama, ku pêşıra we jı mın xelas be, jı bo malê dınê, wusane?" Dest û piyên bavê wi dilerızın.

Qıco wan dıde pêşıya xwe, dıçe nava gund, gazi gundi û cinaran dıke, dibê: "Werın bavê mın işev xewn ditiye, ku zêdeya malê dınê şetelan tine ber derê merıvan." Mêrg û zeviyên bavê xwe bı gundiyan parevedıke û jı bavê xwe ra dibê: "De tu êdi here, xwedê qenciya te qebûl ke."

Gundi gışt ber şabûna govendê dıgrın, Qıco ji dıkeve sergovendiyê weke dina dıreqıse. Hemû hevra yek car bı dengekı bılınd dibên:

"Her bıji Qıco

her bıji Qıco."



ZAROK

REFA QUBEQAZAN

TOLSTOY

Refeke qubeqazan, ji zozanan berbî beriyê, berbî welatên germ dîfiriyan.

Lî ser behrê dîfiriyan. Şev û roje ki firiya bûn, paşê şev û rojeki disa firiya bûn lî ser avê, bê ku rawestin.


Dî ser wan ra hiveke tîji lî ezmana dardakirî bû. Dema ku lî jêrê dî hêrin, hêşnaya behrê dîditin.

Hîngî baskên xwe hejandibûn, êdî bê hêz ketibûn. Pîr westiyabûn. Lê disa ji dîfiriyan, dîfiriyan qet bêhna xwe nedîdan.

Qubeqazên gihîştî ku hêza wan lî cih bû, lî pêşiyê serê refê dikişandin. Lî paş wan, qubeqazên cuwan, yê pîçûk, bêhêz...

Qubeqazeke cuwan lî paş refê mabû. Belengazê hêz dî baskên wê da ne mabû. Hê ji baskên xwe dihejand. Lê rê lî ber wê ne dîçû êdî. Baskên xwe dî ber xwe da berda, bî xwe va zeliqand, xwe serserki berjêr berda. Nêziki rûyê behrê bû, bû, bû. Hevalên wê lî ezmana dî nav tirêjên hîvê da wek nuqteyêke sîpi xwiya dîkîrin.

Qubeqaza pîçûk xwe noqî avê kîr, baskên xwe kîşande ber xwe, pêçand û bî xwe va zeliqand. Lî çar aliyên wê xuşîni bî behrê ketibû. Pêlên avê wê dihejandî wek hêlekanekî.



Refa qubeqazan lî ezmanan, dî nav ronahiya hîvê da, mina werîseki sîpi dîxwiyan. Lê qubeqaza pîçûk hêji dengê çîrpandîna baskên wan dîbîhist.

Paşê ku hevalên wê ji ber çavan wî da bûn, wê stûyê xwe paşda veğerand çavên xwe gîrt. Nîkarîbû xwe bîlîvan da. Pêlan ew bîlînd dîkîr, berjêr dî kîr. Berî derketîna rojê, bakî sîvîk lî ser rûyê behrê pêlên pîçûk dîweşand. Van pêlên pîçûk av dîpekande singê wê. Dema ku wê çavên xwe vekîr lî rojhîlatê sorbûna ezmanan dî. Hîv ji, stêrkên ezmanan ji vemîribûn êdî

Qubeqaza pîçûk axîna kîşand. Stûyê xwe quloz kîr, baskên xwe çîrpand. Serê baskên xwe lî rûyê avê xîst, hejand û bîlînd bû. Her dîçû bîlînd dî bû, bîlînd dîbû.

Paşê ku behr pîr lî jêrê ma, wê, berepêş leza xwe zêde kîr. Ew ji, weke hevalên xwe, ji vê behra bêdeng derbaz bû, berbî beriyê, berbî erdên germ çû.



rêçgeran

Azadê piçûk, rojêke zivîstanê riya xwe wenda kiriye, hûn dîkarin alikariya wi bikin û wi bigihinin mala wi?

ZAROKÊN KURDISTAN

		AP	ZAROKA ÇELEKÊ	EW JI PEZ E	PASNAVÊ DENG BÊJÊKÎ
		HINGIV ÇÊDIKE			
		PÊ MALA KOÇERA			
DAYIK BO HEYWANAN		KURT CEM KÊLEK			MAST JÊ ÇÊDIBE
BAYRAQ		JI NISKÊ MEZINTIR			DILXWEŞ ZAROKA MIHÊ
MEHEK					POZ WÊ DIGRE DOME LI SER MAST
JIN AP					
NEIKO	DÊLA DERZÎ YÊ	KESÊ YEKEM	ŞIL		VEXWARINEK
			RENGEK		TIPA YEKEM
	SERBEST			NE PIJANDI	

* Peyvên rêzên gewr, divê jî wênê(resim)bên girtin!



Koma Zarokên kurd lî Swêdê paşî xebateke dûr-dirêj bandeke nû, bî kîlam-stranên kurdi va tîjî kirin. Dî vê bandê da gelek stranên xweş û şîrin cih girtine. Zarokên ku dî "Dîbîstana Şemiyê" da dîxwîn û wextên xwe yên vala dî vê dîbîstanê da derbaz dîkin, ev band jî aliyê wan da hatiye amadekirin. Dengbêj Şivan jî alikariya wan kiriye.

JI NAV WEŞANAN

LAWÊN SELHATTIN

Nivîskarê Elman Günther Deschner li ser kurdan bi zîmanê Elmani pirtûkek weşand. Navê pirtûkê "SALADINS SÖNNE-Die Kurden, das betrogene Volk" (Lawên Selhattin - Kurd, Geleki hatiye xapandin). Pirtûk bi çaveki diroki hatiye nivîsandin. Her çiqas hîn tiştên xelet, şaş di pirtûkê da hebîn ji, disa ji pirtûkê bi kêrhatî nav pirtûkê da cih girtine.

KURDÊN LI HOLLAND

Yekîtiya Karkerên Kurd li Holland, ji bo danasina gelê Kurd û Karkerên Kurd ku li Holland dimînin, broşûreke informasyonê bi zîmanê hollandi daye weşandin. Navê wê "KOERDEN IN NEDERLAND" e. Di pirtûkê da gelek wê ne û suretên ciwan ji cih girtine.

STRANÊN KURDAYE CIMAETÊ

Îsal li Rewanê Zanîngeha (Akademi) zanistan pirtûkeke Nura Cewari bi navê "Stranên Kurdaye Cimaetê" weşand. Di nav rûpelên pirtûkê da 137 stranên cih girtiye, hemû bi notan va hatine nivîsandin. Pirtûkê stranên kevî jî têda hatine weşandin.

PÊWISTIYA XWENDINA ZIMANÊ DÊ

Ji aliyê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd broşûreke bi navê "Pêwistiya Xwendina Zîmanê Dê" hat weşandin. Di nav pirtûkê da li ser rêvabirina karên pîrsa zîmanê dê li Swêdê hatiye seknandin.

ERMENIZANÎ LI WELATÊN DEREKE

Di nav van rojan da hejmara kovarekê ermeni da, bi navê "Ermenizani li Welatên Dereke" hejmareke taybetî hat çapkirin. Di vê hejmara 8'an da bi sernivîsara "Ji Dîroka Peywendiyên Ermenîyan û Kurdan". Di vê kovarekê da xebata zaneyê kurd Kemal Ahmed bi navê "Kurdistan salên şerê cihaniyê pêşîn da" bi kurte hatiye çapkirin. Ev xebata cara pêşîn di sala 1977'an da li Iraqê hatiye weşandin û ji 412 rûpelan pêk hatiye.

FIRAT

"EUPHRAT" (Fîrat) bi vi navi va li Elmanya Federal helbestvan Hasan Dewran pirtûkeke helbestan nivîsiye. Di nav rûpelên vê pirtûkê da bi zîmanê Elmani gelek helbestên xweş li ser rewşa gelê kurd û li ser Kurdistanê hatine nivîsandin.

ÇEND PIRTÛKÊN ZAROKAN

Li Swêd, ji aliyê "Çapxana Çanda Kurd" ev pirtûkên jêrin; ji bo zarokên kurd, ji zîmanê swêdi hatine wergerandin.

Kino Dîgot "Alikari Bîkîm"

Kino Dîgot "Li Wêderê Bînêre"

(Nivîs. Ingrid û Lasse Sandberg.)

Alfonsê Şit (nivîs. Gunilla Bergström).

HÊLIN

Romana Hêlinê wê carê bi zîmanê kurdi derket, Ev romana Mahmut BAK SÎ, çawa tê zanîn berî çend mehên bi zîmanê swêdi hatibû çapkirin. Di vê zîmanê da serpêhatiya keçeke kurd heye.



NEWROZ

Hevalên Hêja

Çawa em dîbinin ev çend sale agirê cejna Newrozê dî nav mirovên me da roj bî roj gur û geş dibe. Bî hezaran mirovên me, dî vê meha baharê dî vê meha xweş, kesk û şîn da, jî bo pirozkırına cejna xwe, ew dıcvın, dımeşın û bî yek dıl dengê xwe bılınd dıkın. Jı bo rojên azad, xweş û jı bo rojên dılşa ew carke dın kura agirê Newrozê datının, agir û şewata dılê xwe tevi vi agırı dıkın. İro hêzên kolonyalist û kevnepereşt jı ber vê yekê dıxwazın vi agırı vemırının û cejnên Newrozê qedexe bıkın. Lê, hevalno, hûn gelek bawer bıkın ew nıkarın vi agırı vemırının. Ev agır, agirê şoreşêye, dı dılê bı milyonan mırovan da vêdıkeve, lı şerê çıya vêdıkeve newal û şkeftên tari da vêdıkeve, dı hêvi, xebat û camêriya mırovvan da gur dıbe. Bı nalin, qırın, ken û şahiyên mırovên me va, ev agır hın jı geş dıbe. Ev agır agırêki wusaye, dı gırtıgeh û zındanên kolonyalistan da jı vêdıkeve.

Kovara Roja Nû hatına vê cejna Newrozê bı dılgermi piroz dıke, vi agırı ra hemêz vedıke û sılavan lê dıke.

■ ■

LI ELMANYA



SAMSTAG, 10 März 1984, um 19.00 Uhr.
2000 HAMBURG 13- Audi Max-Halle(Uni)
Von Melle Park 4 (S-Bahn Dammtor-Bahnhof)

SAMSTAG, 17 März 1984, um 19.00 Uhr.
1000 BERLIN 33 - FU Audi Max, Henry Ford
Bau, Garystr. 35 (U-Bahn Thielplatz)

SAMSTAG, 24 März 1984, um 19.00 Uhr.
41 DUISBURG Hamborn, Rhein-Ruhr Halle
Walter Ratenastr. 1. B.
(Straßenbahn 909, Bus 905, 910)

SAMSTAG, 31 März 1984, um 19.00 Uhr.
8000 MÜNCHEN 40- Schwabinger Bräu
Leopoldstr. 82 (U-Bahn Münchener Freiheit)

İsal, jı bo pirozkırına cejna Newrozê, Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan lı Elmanya Federal (KOMKAR) lı Berlinê û sê bajarên dın da şahiyên mezin amadekırıye.

Lı Swedê jı Federasyona Karkerên Kurdistan dı 17 meha Adarê lı Stockholmê şeveke Newrozê wê pêk bine. Lı Norweç, Danimark û wela tên mayın jı, bona pirozkırına cejna Newrozê şev û şahı wê çê bı bın.



teşirês

Siyabend

BIHA: 10:— kr.